DÎTINEK JI DER VE

Çawan Mêjû Berûvajî dihê Nivîsîn

Dr. Ebdulbaqî Mayî

abdulbaghi.ahmad@bupinst.uu.se

Tîrmeha sala 1992-yê, li welatê Siwêdê, me kombûnek di navbeyna sekreterê rêkxirawa Qendîlê yê wî demî, Per Alan Olsson û wezîrê hukûmeta Kurdistanê yê wî zemanî, Dr Kemal Şakir, digel seroka Pişka Saxlemîya Derona Zarokan li Zankoya Uppsala li Siwêdê, profesor Anne-Liis von Knorring pêk hîna. Me ji bo avakirina yekem Bingehê Saxlemiya Derûna Zarokan li Kurdistanê bi nave (Hewar) pêkhatinek îmza kir. Evro nûnerê rêkxirawa Diyakonia ya Siwêdî li Kurdistanê, Anders Svensson, di projekê de daxwaza pareyan ji wezêrê Tenduristiyê Kurdistanê dike û tê de dibêje ku Diyakonia yekem bingehê saxlemiya derûniya zarokan li Îlona sala 200-ê li bajêrê Duhokê damezrandiye.

Her di vê projeyî de, nûnerê Diyakoniya dinivîse ku evê rêkxirawê bi alîkariya hindek dektorên Siwêdî ev bingehe dahînaye. Rastiya wê jî ew e ku 21-ê Îlona 2001-ê, li bajêrê Duhokê yekem Pişka Saxlemiya Derûna Zarokan li Kolîja Pizîşkî li Zankoya Duhok, bi terzek fermî, ji layê cenabê Parêzerê Parêzgeha Duhokê yê wî demî, Nêçîrvan Ehmed û bi amadebûna serokê beşê saxlemiya Derûna Zarokan li xestexaneya Akadîmiska Uppsala hate vekirin.

Nûnerê Diyakoniya, her di projeyê xwe de pesn û sena rêkxirawa xwe dike ku xwandina kolîjê u xwandina bala di babetên saxlemiya derûna zarokan de, wan li Kurdistanê bi rê ve biriye. Ew ji bîr dike, yan ji bîra xwe dibe, ku pişka saxlemiya derûna zarokan li kolîja pizîşkî, li Zankoya Duhokê, her ji sala 2000-ê de, bo cara yêkê li hemû rojhelata navîn xwandevanên deploma bilind (Master) werdigirin û li ser pêkhatina zankoya Duhokê li gel zankoya Uppsala bawernameyê pê dide. Çi Diyakonya an rêxirawên din beşdarî vê perosesê nîn in.

Ev e wesa, mêjû bi xelet dihê nivîsîn. Her ji bo rastiyê û ji ber ku avakirina Kurdistanê li ser bingehên zanistî û rast bihê bicihînan, divê rastî bo xelkê me diyar bibe. Herwesa, bila bes be ku em ji bo xelkê biyanî xwe diçemînin û ya ji me ve her çavşînek ji der ve bihê pêxemberek e. Dezgeh û bisporên me kurdan, ew qas zor in, ku gelek caran ji biyaniyan zîrektir, rasttir û dilsoztir in.

Baş nebû hêşta em sax ev hat nivîsîn, ku yên beşdar hemû hêj sax in û dişên bo vê êkê şehdekiyê bidin. Yan no?!